Kurmancî

GGG Kontaktstelle
Gastfamilien für Flüchtlinge
c/o GGG Benevol
Marktgasse 6
CH-4051 Basel

T +41 75 413 99 65
E info@ggg-fluechtlinge.ch

www.ggg-fluechtlinge.ch

Agahî ji bo penaberên xwedî îqame û mafên rûniştinê N, F û B

Hûn dixwazin li cem malbateke mêvandar jiyan bikin?

Em derfet û mecalê didin penaberan li cem malbatên mêvandar, ku li kantona bajarê Basel rûniştine, jiyan bikin (Ev malbat hinek ji wan xwedî zarok, ciwan an jî kesên kal û pîr in, an jî kesên bi tenê jiyan dikin an jî malên çend heb mirov bi hev re dijîn).

Hûn dikarin bi rêya jiyanê li cem malbateke mêvandar zimanê xwe yî Almanî xurt bikin û tevle jiyana rojane jî bibin.

Çi di vê derfet û pêşniyarê de heye?

- Hûn di odeyekê de bi tenê jiyan dikin û hûn dikarin deriyê odeya xwe jî li ser xwe bigirin.
- **Mitvex û aşxane, hemam, odeya rûniştinê** û cihên din di xanî de **ji bo hemû kesên din in jî ku li malê jiyan dikin**.
- Pirs li ser şiklên din yên tevjiyanê (çûyîna bazarê û sûkê, xwarinçêkirin û tiştên din) dema mirov bi hev re rûne û bicive, mirov dikare behs û nîqaşa wan bike.

Kesên meraq dikin û tiştekî wisa bi dilê wan be?
ew dikarin xeberê bidin şêf û şexsên mesûl û berpirsiyar an jî rasterast telefonî Dezgeha Têkiliyên GGG bikin: Tel. +41 75 413 99 65.

Gavên piştre tên çi ne?

Dema meraq hebe yek li cem Mmalbatek mêvandar bijî **civîn û rûniştinek ne pêgirî û mecbûrî** bi GGG Dezgeha Têkîliyên Malbatên Mêvandar Ji Bo Penaberan re çêdibe, di vê civînê hûn dikarin hemû tiştên ne aşkere pirs bikin. Em ê jî hingê bizanibin tiştên girîng û muhîm ji bo we çi ne.

- Li gorî meraqa we em malbateke mêvandar nîşanî we dikin.
- Em bi hev re diçin ji bo malbatê nas bikin û li odeyê binihêrin.
- Dema malbata mêvandar jî piştî hevdîtinê biryar da hûn bi hev re jiyan bikin, mirov dikare hingê peyman û eqda kirê îmze bike.
- Peymana kirê ji bo neh heyvan e. Eger we di vê navberê de xaniyekî din ji xwe re dît, peymana kirê dikare were betalkirin.
- Piştî neh mehan derfet û firset heye, eqda kirê were dirêjkirin.
- Sozialhilfe ango dewlet kirêya ji bo xanî ji dêvla we dide.

Nîşeyeke muhîn û girîng

kesên daxwaza wan ya penaberiyê nehatiye qebûlkirin nikarin xwe qeyd bikin. Ev pêşniyar û derfet tenê ji bo penaberên xwedî îqame û mafê rûniştinê N, F û B.

Zanînên zêdetir hûn li ser malpera me dibînin: Homepage www.ggg-fluechtlinge.ch